



ZAGONÊN MALÊ taybet bi avahiyên kirê yê şaredariyê

Her kesê ku li avahiyên şaredariyê de dijî pêwîste alîkariya pêkanîna refaha giştî û afirandina jîngeheke baş bike.

Hûn wekî kirêdarek jî lihember mêvanên xwe berpirsiyar in.

1. Aştî û aramiya giştî

a. Divê aştî, aramî û bêdeng di navbera demjimêr 11-ê şevê heta 7-ê êvarê li hundir û derveyên rûniştgehê pêkwere.

Di demjimêrên din ê rojê de jî, divê rûniştvan baldar bin û cîranên xwe aciz nekin.

b. Dergehên têtetînê û derên jêrmînê û odayên binerd hrtim berbest bin.

2. Cihê rûniştinê

a. Wekî kirêdarek hûn berpirsin ku rûniştgeha xwe paqij û parastî ragirin. Herwisa hûn berpirsin ku eger zirarek di rûniştgehê de pêk were, yan jî hûn ajelên malê di rûniştgehê de bibînin, bilez mijarê rapor bikin.

b. Di destavxanê divê tenê kaxeza destavê were avêtin. Di dema astengbûna bîra tûwalê, divê bi vekirina kuna destavxanê û çareserkirina astengiya destavxanê vê vekin û hûn liser vê babetê berpirsiyar in.

c. Ji bo ku pêşî ji ziyana nêr û derketina kevûkan bigirî, divê hertim pencereyên hevakêşê vekin û bi rêkûpêkî di avahî de hevakêş bikar bînin. Ev yek di tevahiya salê de derbas dere. Dema çêkirina xwarinê, herdem hevakêşa kûçikê vekin.

d. Damezirandina antena derveyî qedexe ye.

e. Dakutana dûşek û bataniyan di balkonan an pencereyan da qedexe ye.

f. Xwarindana ji balindeyan di malê de qedexe ye.

g. Hûn berpirsin liser guhertina bateriyên zenga şevatê û herîkê salê carekê divê temirînera agirî hilkin.

3. Qadên hevpar

a. Kirêdar divê eşyayên xwe yê şexsî li cihê rûniştgeha xwe de, an jî di odeya ku ji wan re tê terxan kirin, biparêzin. Xwedîmal dikare bê ragehandina pêşîn, amûrên li qadên hevpar rakirin.

b. Tirimpêl an wesayîten din ê neqeydkirî nabe di avahiyê şaredariyê de wer park kirin.

c. Hemû kirêdaran berpirsin ku rêzê ji qaîdeyên heyî yê şaredariya Trondheim li ser veqetandin çopên ji malê, bigirin. Nabe bermayî û çopên şexsî qet ji cihê ji derveyî depoya şaredariyan bèn bicîkin. Kirêdar bixwe liser rakirina tiştên mezin bo herêma binaxkirina çopan berpirsin.

4. Ajelên malbatî

a. Bi giştî du ajelên malbatî wekî kûçik û pisîkek izindar in. Eger ajelên we bibine sedema aciz bûn an nerehet bûna niştecihên din an zirarê bigehînin tiştên kesên din, Şaredariya Trondheim dikare ji we bixwaze ku wan derxînin.

5. Daxistina malê

a. Qanûnên malê beşek ji peymanê kirê ye. Bînpê kirina ev qanûnan, tê manay bînpêkirina peymanê kirê, û dibe ku bibe sedema qerebû kirina ziyanan, bidawî hatin an betal kirina peymanê kirê.

6. Gilîya li ser jîngehê jîyanê

a. Eger cîranên we zagonên malê bînpê dike an we nerehet dike, gilînameyek nivîskî radestî şaredariya Trondheim bikin. Dikarin gilîya xwe bi rêya rûpela webê "Gilîya li ser hawîrdorê" ("Klage på bomiljø"), bi rêya emaila bi navnîşaniya bomiljo@trondheim.kommune.no an jî bi rêya nameyê bişînin.